# DEMA NIHA

## ÇAR HEZAR TON BOMBE HATINE AVÊTIN

### Refên Hevalbenda Bê Etlahî Li Hêjagehên Mihwerê Dixin

Londre — A.F.I. Di nav 48 saetên dawîn de refên brîtanî û amerîqanî direjî şaristanên elemanî Berlîn; Boxum, Duisburg, Kîl û hêjagehên erdê Rûrê kirine û 4000 ton bombe avêtine.

Cezayir — Leşkerên frensizî di Tûnîsê de 36000 eskerên Mihwerê hêsîr girtine û 200 top standine.

Londre — R: Wezîrê Brîtanya Mezin ê Şerî Sir Cêmis Grîg roja Şembê gotiye: fermandarê Ordiyên Brîtanî li Tûnîsê General Aleksander ji min re digot ko Şerê Efrîqa Bakurî li 15-ê Gulanê dê biqede: lê min qîma xwe pê ne dianî û bawer dikir ko General Gelek nîkbîn e; lebelê nîho xuya bûye ko wî rast didît û Şerê Efrîqayê berî bi du rojan ji wexta ko General Eleksander tebitandî bû gihaye dawiya xwe.

# 2000 BALAFIR

Waşington — A. F. I. Di şerê Efrîqayê de refên hevalbenda 2000 balafiren Mihwerê avêtine erdê ji Hevalbenda 770 mêkîne çûne.

Moskû — A. F. I. Tête bawer kirin ko di Eniya Rûsî de şerî ne mezin ber bi destpêkirinê ne.

# Hevde Generalén Mihwerê

### Ketine Destê Hevalbenda û bûnê hêsîr

Londre — R: Di erdê Tûnîsê de 17 generalên Mihwerê ketine destê hevalbenda û bûne hêsîr; 14 generalên elemanî û 3 talyanî.

Londre. — R: Wezareta brîtanî a şerî dide zanîn: Refên hevalbenda yên qerargehên Efrîqa Bakurî ji 8-ê kanûna berê û heta 18-ê nîsanê 386 car direjî hêjagehên Mihwerê kirine û 16,236,590 libre bombe avêtine wan armancan. Pênc mehên Efrîqayê ên dawîn de, bi derbên balafirên hevalbenda 50 waporêd Mihwerê bin av bûnê û 73 heb jî şikiyane.

# HINDIK RINDIK

### Telegrafa ko General Aleksander şiyandiye Mr. Çorçil

Londre — R: General Aleksander, fermandarê leşkerên brîtanî li Tûnîsê; zefera Efrîka—Bakurî, bi telegrafa jêrîn ji serekwezîrê Brîtanya Mezin Mr. Çorçil re elam daye: Min divê, ezê ji we re bidim zanîn ko Şerê Tûnîsê qediyaye. Dijmin xwe avêtiye bextê me. Peravên erdê Efrîqa Bakurî de destê me de ye.

BEGÊ TÛNÎSÊ Ê NÛ

Tûnis — A.F.I. Bi qerara General Jîro û ji bona selametiya Tûnîsê, Begê vê erdê ji text radabû û ji begîtiyê ket. Li gora tevgera malbata Tûnîsê, Sîdî Amil Beg wê bikeve şûna wî û li ser textê wî rûnê.

# Danezana sovyetî a Dawîn Alan Dide

Moskû — A.F.I. Danezana sovyetî a nîvê şevê elam dide: di tevayiya qadên şerî de rewişa eskerî ne guheriye. Refên sovyetî di şerên hewayî de û li erdê 370 balafirên dijmin xira kirine; 104 mekîneyên sovyetî venegeriyane warên xwe, Çekê rûsî ê hewayî di qadên şerî de 60 qamyon tejî esker an çek û cebilxane dagirtî xira, 10 betariye top û 5 betariye qumbeŕeavêjên çepera lal û du waporên dijmin bin av kirine.

# Wezareta Britanî a Hewayê Elam Dide

Londre — R: Wezareta brîtanî a hewayî dide zanîn: Refên me direjî balafirgehên dijmin yên Kaen û Morleksê kirine û di vê navê de 2 mekîneyên dijmin avêtine erdê.

Nêçîrvanên me jê pê ve zora xwe dane hêjagehên dijmina ên rêhesinan û waporên di wan.

Londre — R: Radyoya-Romayê elam dide: Bi bombardimanên refên hevalbenda di Sivita Beçiyayê de— Bendera Romayê — 174 peya hatine ku tin û 300 heb jî brîndar bûne.

# AZAHIYA WELATÊ FRENSÊ

## GOTARA GENERAL JIRO LI BIZERTÊ

Cezayir — A.F.I. General Jîro di Bizertê de gotiye leşkerên Frensê: Ez bi we serbilind im; di zeftkirina Tûnîsê de we karine hêja pêkanîne, di xelasî û azahiya Frensê de jî honê bi awakî girane bikêrî welet bên.

Londre — R: Sir Arşibald Sinkler, wezîrê brîtanî yê qiwetên hewayê gotiye: Di nav 12 rojên şerê Tûnîsê ên dawîn de, bombeavêjên hevalbenda bi top û bomban 3000 car êrîşî qiwetên Mihwerê kirine û nêçîrvan 14,000 car bi hewa ketine.

# MIREKA CIHANE

MIRÊKA CIHANÊ MIRÊKA WÊNEYÊN ŞER Û AŞÎTIYÊ

## Xelasiya Tûnîsê



ALA FRENSÊ JI NÛ VE DI SER TÛNÎSÊ RE PÊL DIDE.



QIWETÊN FRENSIZÎ DI KÛÇE Û KOLANÊN TÛNÎSÊ DE.

# NÊÇIRVAN BOMBEAVÊJ

Bombeavêj an balafirên bombeavêj mekîneyine giran û mezin in, heft heşt ton bombe hildigirin, bi du, sê an çar motoran e. Bi 2-4 top û bi 6 û heta 8 mitralyozan biçek kirî ne. Tê de 8 û heta panzde peya hene ew karên vê mîkeneyê digerînin.

Torpîlavêj mîna balafirên bombeavêj mekîneyine giran û mezin in, lê bi torpîla qesda neyaran, waporên neyaran dikin.

Di nav bira torpîl û bombe ferka bingehîn ev e: bombe rast bi rast têtê berdan armancê, lê dikeve û pê avahî, top, wapor, tang xira dibin an xesarê dibînin. Torpîl berî dikeve avê, tê re dimeşe û tê li armancê dixe.



Nêçîrvan balafirine sivik in û piraniya wan bi motorekê ne. Di saetkê de 600 - 700 kilometre difirin. Tê de 2 û heta 4 peya hene. Bi 2-4 mitralyoz û topeke sivik bi çek kirî ne. Bombeyine sivik hildigirin; bombeyine şewat û teqandinê.

Karê nobetdarî û dîdevniyê pêk tînin çavê xwe li bajar; bender, qerargeh, war û komeskerên dijmina digerînin, li çûn û hatina wan dinêrin û tên dîtina xwe pêş fermandariyê dikin, pê fermandarî qesd û armancên dijmina çi ne seh dike; jê pê ve ew Bombeavêj û torpîlavêja ji tada nêçîrvanên neyar diparêzin, zora xwe didin wan û heke ji wan hat bombeavêja bişunda vedigerînin. Di ser qada şerî re difirin û bi top, mitralyoz û bombeyên xwe direjî leşkerên dijmina dikin. Ew pêş- û piştmêrên bombe- û torpîlavêja ne.

www.arsivakurdi.org

# DURIK

DÛRIKÊN LI BER TEMBÛRÊ



## Sêvê

Ax lê Sêvê û ax lê Sêvê
Deqek şînê, l'serê lêvê
Sêv qubar e, b'min naxêve
Ax lê Sêvê, û ax lê Sêvê.

M' Sêvê dî bû l'ber avê
Singê gewir da bu tavê
Ezê bi çeplê te bigrim
Bavêm qeza Eyintabê.

Rêşya şa'rê daket navê
Bihar hatê dar biskêvê
Payîz hatî wextê keyfê
Havîn hatî dilaxêvê.

M' sêva xwe dî L' ber dîwarê
Wê da bû cotê guhêrê
Ezê bi çeplê te te bigirim
Tê bavêm welatê jêrê.
Tama memikê te xweş e
Mîna şekirê bajêr e

Mi' Sêva xwe dî l'ser xaniya
Tena, tena dimeşiya
Min dest avêt cotê gulya
Bi ser min de hatiya
Wek kevanê Bûçiya
Ez ketim dilim êşiya
Kul ket mala gundiya
Ji xelaf xort û naşiya.

## Mero

Dor Bêrûtê bi Zeytûn ê
Şîrîn şerbet î lê Mero
Tu di ber derîkî mermero
Şirîn şerbet î lê Mero.

Her du diranên te zêro
Şêrîn şerbet î lê Mero
Xulam qama girovero
Şêrîn şerbet î lê Mero

Wê enîka bi nîv zêro
Eman ne ma lê Mero
Ez ban te dikim tu î khero
Bejin ziravî ji darê tero
Ezê bi çeplê te bigirim
Bibim ji canê xwe ro.

## Strana Kurdî

## WEY LO SIWARO

Wey lo Siwaro, wey lo Siwaro
Heyran Siwaro, çiya bilind e,
Ez te na bînim;
Destê xwe davêjim baqê gul û rêhan
Û nêrgîza, na qetînim,
Li min û bavê min heram be,
Di dû çavê Smaîlê Eyo
Ez tu dila, li dinyayê na hebînim.

Wey lo Siwaro, wey lo Siwaro
Siwaro heyran;
Serê sibehê ez rabûm
Min karek ne kir
Min destê xwe
Di ava sar û germ da nekir.
Min dî qereçî geriyan
Min ji xwe re falek vekir
Hatiye cewaba nexeyrê
Ji min re gotiye:
Torinê dilê te keçikê girtine
Bi destê Smaîlê Eyo kelepçe kirine
Birine stasyona Diyarbekir.

Wey lo Siwaro, wey lo Siwaro
Siwaro ez ne li vir û ne li wê mo
Ezê perçakê ewrê reş ê
Li ser behrê mo
Ezê hûr barana tev li bê mo
Ezê dosta Smaîlê Eyo
Bavê Evdil qadir
Siwarê ciwaniya şê mo.

Wey lo Siwaro, wey lo Siwaro..
Min dî dîkê nîvê şevê
Li min xulxuland,
Smaîlê Eyo, torinê dilê min keçikê
Daket hewşa mezin,
Ciwaniya şînboz dixemiland,
Siwar bû berê xwe da
Welatê xerîb û xurbetê;
Ezê bi ser banê qesrê ketim
Min sê denga bi dû de, dinûhirand.

Wey lo Siwaro, wey lo Siwaro...
Xopana gundê me bişewitê.
Rê di ber ra......
Min dî tabûra lawikên Kurdistanê
Bihurîn di ber me ra.
Min go: gelî xortino ji we oxir be
Honê bi kûda herin
Digo;
Emê herin bajarê Mûşê, li ser şer e

---

## KULINGO

Lo wey lo....
Kulingo, tu kulingê deşta vê Yemenê
Tu çima ji qewm û refê xwe qetiyayê
Tu mayî wiha bitenê
Te hêlîna xwe çêkiriye
Li zozanê Şerefdînê
Li deşta Hezargolê
Li ser koşka bavê Siyabendê
Li ser sûra vê bedenê,
Keçik ban dikirê Lawiko!
Mala bavî, şewitiyo!
Şevkê, ji nîvbenda şevan û pê ve
Were tewafa sing û berê minê
Kalî, gewrî, bozî, beyazî û deqandî;
Bila hêdî, hêdî li ser te bê
Xweydana ber vê çenê.

Lo wey lo...
Kulingo, tu kulingê deşta vê Mûşê
Xwedê hebîna
Çima tu ji qewm û refê xwe
Veqetiyayê
Te hêlîna xwe çêkiriyê
Li zozana Şerefdînê
Li deşta Bingolê
Li ser tayê wê kalûşê
Sala par vî çaxî
Keleşgewra min ê
Ji qîzan qîzek bû
Dimala bavê xwe de bû
Sala vê salê...
Ez xiyala xwe didimê
Sor sê biskê xwe yê narincî
Berdane ser darê mîrata vê dergûşê.

Lo wey lo...
Kulingo, tu kulingê deşta Wanê
Xwedê hebîna
Çima tu ji qewmû refê xweveqetiyayê
Tu mayî bitenê
Te hêlîna xwe çêkiriye
Li zozanê Şerefdînê
Li deşta hezargolê
Li welatê Kurdistanê;
Li ser milê mîrata wê dikanê.
Keçikê ban dikirê, digo:
Lo, lo, Lawiko
Kula Şam û Helebê
Di mala bavê te keto
Şevkê ji nîvbenda şevan û pê ve
Were devê xwe bavê
Boxaza qirika min î
Kalî, gewri, bozî, beyazî û deqandî
Bîstikekê devê xwe têxe
Bila mîrata vê kitanê.....

# PÊJINÊN DINYAYÊ



ZIREHPÛŞA FRENSIZÎ PROVANS



BALAFIRVANÊN BRÎTANÎ



TOPEKE RÛSÎ A PERASTINA PERAVAN



ZIREHPÛŞA INGILÎZÎ NELSON

IMP. LE MIROIR D'ORIENT BEY...

www.arsivakurdi.org